Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :422 nameronahi@gmail.com 29- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Kampa Berxwedan navnîşana dilêriya gelê Efrînê ye





Idrîs HENAN

Di navbera navçeya Fafînê û gundên Um Hoş û Wehşiyê de, ji çar mehan ve, Kampa Berxwedan a koçberên Efrînê li ser rûpîvaneke bi qasî 10 hiktaran rûdine. Di kampê de 750 kon hatine venandin. Li gorî Hevserokê Meclîsa kampê Şêxo Îbrahîm di van konan de 750 malbat dijîn. Ango bi qasî 3400 mirovan in. Li gorî serjimariya kampê ji vê hejmara nişticiyên kampê; 1425 mêr û 1383 jin in. Zarokên temenê wan navbera 1 û 2 saliyê de 161, navbera 2 û 6 saliyê de 317, navbera 6 û 12 saliyê de 482 e. Hejmara keçikên temenê wan navbera 12 û 20 saliyê de 300, a xortan jî 253 ye. Jinên navbera 20 û 60 saliyê de 705, mêr jî 633 ne. Jin û mêrên ku temenê wan 60 saliyê derbas dike jî 175 in.

### RÊXISTINKIRINA KAMPÊ



Hacer Şêx Hesen Cîgira Hevserokatiya meclîsa Kampê Berxwedan derbarê awayê birêxistinkirina jiyanê li Kampa Berxwedan de ev agahî bi me re parve kir: Ji bo birêvebirina jiyanê, kamp li gorî taxan hatiye dabeşkirin. Li her taxek komînek heye. Di her komînekê de 5 komîteyên xizmetguzarî, jin, parastin, tendirustî û lihevanînê hene. Li gorî hewceyê jî komîte tên zêdekirin. Di kampê de 14 komîn hene. Her komînek 55-60 konan digire nav xwe.

### PERWERDE



Hevserokê Meclîsa Kampa Berxwedan Şêxo Îbrahîm aliyê perwerdê di kampê de wiha vegot: Ji bo şagirtên kampê bi koordîneya bi KPC-Demokratîk re dibistanek ji 20 refan hatiye vekirin. Di dibistanê de zêdeyî 495 şagirtên seretayî, 295 navîn û 182 amadeyî dixwînin. Ji ber kêmderfetiyan, destpêkê de şagirtên seretayî dest bi xwendinê kirin. Ew jî wê di 2 Tebaxê de karnameyên xwe werbigirin. Niha jî herdu refên navîn û amadeyî dixwînin.

### XIZMETGUZARÎ

Cîgira Hevserokatiya Meclîsa Kampa Berxwedan Hacer Şêx Hesen xebatên xizmetguzariyê li kampê wiha rave kir: Lojistîka kampê bi vî karî radibe. Mehê carekê sebze, du caran pêdiviyên xwarin, cil û berg û paqişiyê tên belavkirin. Ji bo çareserkirina pirsgirêka bêkariyê du sûk hatine vekirin. Di 80 dikanên herdu sûkan de bi qasî 150 kes dixebitin. Ji bo ku ciwanên me betal nemînin, karên derveyî kamp mîna "pale, çinîn, tamîrat...hwd" tên dabînkirin. Lê dîsa jî têrê nake. Derbarê ceyran û ava kampê de Hesen got: Li kampê du ceneretor dixebitin. Hawûz û varêlên mezin ên avê li tevahiya kampê belvkirî ne. Herwiha ji bo paqijî û avdestxaneyan jî gelek cih hatine avakirin û kerevanên taybet hatine bicihkirin.

### TENDIRUSTÎ

Hevserokê Meclîsa Kampa Berxwedan Şêxo Îbrahîm derbarê rewşa tendirustî de got: Li kampê tenê Heyva Sûr a Kurdî noqteyên tubî vekiriye. Carcaran hinek textorên pispor ji bo çend saetan heftane carekê ji Helebê tên. Lê bi giştî hejmara textorên pispor, alav û cureyên dermanên pêwîst têrê nake. Ne saziyên navneteweyî dişînin û ne jî rejîm rê dide em bi xwe bînin. Gelek mirovên me yên nexweş ji ber van nêzîkatî û kiryarên rejîmê jiyana xwe ji dest dane.

### NY SÛCDAR E

Îbrahîm derbarê avakirina kampê û aliyên ku destek dane de ev tişt anî ziman: Li gorî rêgez û gerdişên navneteweyî, pêwîst bû saziyên girêdayî NY yên mîna UNHCR, HCDH, UNISEF, OMS,... hwd xwedî li gelê Efrînê derketibana. Lê mixabin ev sazî û dezgeh tenê sernavekî fireh in ku li gorî berjewendiya hêzên serdest tevdigerin. Îbrahîm tekez dike ku ev kamp bi îmkanên xweser û piştgiriya Rêveberiyên Xweser ên Cizîr, Kobanê, Şehba û Efrînê hatiye avakirin. Hemû xizmetên av, ceyran û kenalîzasyonê şaredariya kampê ku girêdayî Şaredariya giştî ye pê radibe. Îbrahîm nav axaftina xwe de got: Ji bilî Heyva Sor a Kurdî, gelên Rojava, Bakur-Rojhilatê Sûriyê ti kesek an aliyekî dîtir destek nedaye şêniyên Kampa Berxwedan. Derheqê gelê Efrînê de NY sûcdar e.

### DEV JI DURÛTIYÊ BERDIN

Dawiyê de Cîgira Hevserokatiya Meclîsê Hacer Şêx Hesen tekez kir ku gelê Efrînê ji bo ku dûrî axa Efrînê nejî, li Şehbayê bi cih bûye. Tevî hemû zehmetiyan şêniyên Efrînê bi ruhê Berxwedan Serdemê li van kampan dijî. Hêviyên vegerê mezin in. Her çavên gel li riya Efrînê ne. Zilm û zora dagirkeriyê bingeha hevgirtina civakî ya ji pola ava kiriye. Ji aliyê xwe ve Hevserokê Meclîsa Kampa Berxwedan bang li sazî û dezgehên navneteweyî kir ku xwedî li erk û misyonên xwe yên mirovî derkevin û got: Êdî bes e! dest ji vê durûtiyê berdin.

Hêjayî gotinê ye ku dewleta dagirker a Tirkiyê û çeteyên wê di 20 Çileya îsal de êrişî Kantona Efrînê kirin. Gelê Efrînê û şervanên wê 58 rojan bi îmkanên biçûk li hemberî van êrîşên hovane li ber xwe dan. Di encamê de, di 18 Adara îsal de gelê Efrînê mecbûrî koçberiya ber bi Kantona Şehbayê ve dibe. Ji bo ku gelê Efrînê ji warê xwe dûrnekeve li Şehbayê di nava herdu kampên (Berxwedan, Serdem) û gundan de bicih dibe. Heya niha jî ti sazî û rêxistineke navneteweyî yên eleqedar ne jî rejîmê destek nedane şêniyên Efrînê.



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 422 29 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî


## Li Sêmalka çalakiya ciwanan berdewam dike



Çalakiyên ciwanên Rojava û Bakurê Sûriyê yên li deriyê Sêmalkayê bi armanca ku li dijî dagirkeriya Tirk derbasî başûrê Kurdistanê bibin berdewam dike. Şandeyeke ji Kongreya Star û Partiya Yekîtiya Demokratîk serdana konê çalakiyê kirin. Ciwanan diyar kirin ku heta ew bighêjin armanca xwe ew ê çalakiyên xwe bidomînin. *R-2*

# MÎNAKA TECRÎDA LI ÎMRALIYÊ LI CÎHANÊ TUNE YE

***Tecrîda şidandî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dike. Nêzî 2 sal in bi ti awayî agahî ji Ocalan nayê girtin. Nerazîbûnên li hemberî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurda Abdullah Ocalan berdewam dike.***




### TECRÎD LI DIJÎ MIROVAHIYÊ YE

Rûspî û oldarên herêma Dêrikê tecrîda li ser Ocalan şermezar kirin û bang li saziyên mafên mirovan yên navnetewî kirin ku bi erka xwe rabin û helwestê nîşanî tecrîdê bidin. Oldaran got, "Ocalan ji bo hemû gelên bindest têdikoşe. Tecrîda li ser Ocalan tecrîda li ser hemû mirovahiyê ye. Tecrîda li ser Ocalan sûcekî li dijî tevahî gelan e."

### WÊ TÊKOŞÎNA ME DEWAM BIKE

Parêzerê Ocalan Mazlûm Dînç diyar kir ku tecrîdeke mîna ya li ser Ocalan li devereke din a cîhanê tune YE û got, "Mafê nivîsandina nameyan û axaftina bi rêya telefonê yên bi Birêz Ocalan bi salane tên astengkirin. Hewldanên me yên hiqûqî wê li qada neteweyî û navneteweyî dewam bikin. Têkoşîna me ya li dijî tecrîdê wê bidome." *R-5*

## Li dijî êrîşan yekîtiya gelê Kurd pêwîste



Endamê Komîteya Giştî ya Partiya Demokratîk a Kurd Li Sûriyê Fethullah Hiso diyar kir dewleta Tirk hewl dide di serî de başûrê Kurdistanê desketiyên hemû kurdan ji holê rake û li hember êrîşan banga yekîtiyê li hêzên Kurd kir. Hiso wiha got, "Divê Kurd li hemû parçeyan destkeftiyên xwe biparêzin û li hember êrîşan bibin yek." *R-4*

## HDP'ê nameya piştgiriyê ji Yunanîstanê re şand




Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê ji ber şewata li daristanên Yunenîstanê ku 83 kesan jiyana xwe ji dest dan û 180 kes jî birîndar bûn nameyek piştgiriyê ji Yunanîstanê re şand. Di nameyê de hat gotin, "Li erdnîgariya we, daristanên we tevî hemû zindiyên di nav de, dişewitin û dilê me jî bi wan re dişewite. Em bi vê êşê zanin û baş nas dikin. Çi ji destê me bê em amade ne bikin." *R-4*

## Qedexeya li ser PKK'ê encamê nagire



Rêxistina Parastina Destûra Bingehîn ku saziya îstîxbarata navxweyî ya Elmanyayê ye, rapora xwe ya par roja Sêşemê ji çapemeniyê re eşkere kiribû. Di raporê de hate ragihandin ku PKK li gorî salên bihurî hêza xwe dipareze. Parlamentera Partiya Çep Ûlla Jeplke ku dostê gelê Kurd e nerazîbûn nîşanî raporê da û got, "qedexeya li ser PKK'ê bi kêr nayê." *R-2*

## Eşîra El Bobena li dijî çeteyan rabû



Ji ber kiryarên dagirkeran li Efrînê gel bêzar bûye. Çete her roj li Efrînê davêjin ser malan welatiyan direvînin û dest datînin ser malên wan. Li gundê Koçoman yê Cindirêsê 13 kesên din revandin. Li navenda Efrînê jî ji ber ku dagirker diziyê dikin eşîra El Bobena li dijî wan rabûn. *R-2*

## Leşkerên Rûs demeke dirêj wê bimînin



Serokê rêjîma Sûriyê Beşar Esed diyar kir, leşkerên Rûs ên ku ji sala 2015'an û vir ve li Sûriyê ne, pêwîstî pê heye ku 'demeke dirêj' lê bimînin. Esed bi bîr xist ku peymana bi Rûsyayê re li ser Baregeha Leşkerî ya Hîmeymîmê hatiye îmzekirin ji bo 40 salane. *R-5*

## MSD'ê serdana Şamê kir



MSD xebatên xwe yên ji bo çareseriya aloziya Sûriyê û demokratîkbûna Sûriyê bê navber didomîne. Heta niha MSD'ê ji bo çareseriyê gelek proje pêşkêşkirine û gelek caran eşkere kiriye ku ew ji danûstandinê re amade ne. Heyetek ji rayedarên payebilind yên MSD'ê li ser vexwendina hikûmeta Sûriyê bi awayekî fermî serdana Şamê kir. *R-4*

## Jinên Kurd serkeftî û berxwedêr in

Duyemîn konferansa Kongreya Star ya Şehbayê bi duruşmeya "bi rihê berxwedana serdemê em ê şoreşa jinê civakî bikin" di 26'ê Tîrmehê de bi beşdariya 500 delegeyan hat lidarxistin. Di konferansê de biryarên girîng hatin girtin. Berdevka Kongreya Star a Evîn Siwêd konferans nirxand û diyar kir ku berxwedana jinên Efrînê mohra xwe li konferansê xist." *R-3*



## TJA'yê ji bo Şengalê bang li NY'ê kir



Tevgera Jinên Azad TJA'yê têkildarî salvegera êrîşên DAIŞ'ê yên li ser Şengalê ku di 3'ê Tebaxa 2014'an de destpêkirin û di encamê de bi hezaran Êzîdî hatin qetilkirin daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) kirin ku roja 3'ê Tebaxê wek "Roja Çalakiya Navneteweyî ya li Dijî Tevkujiya Jinê û Qirkirinê" binase. *R-4*

# Eşîra El Bobena li dijî çeteyan rabû

***Ji ber kiryarên dagirkeran li Efrînê gel bêzar bûye. Çete her roj li Efrînê davêjin ser malan welatiyan direvînin û dest datînin ser malên wan. Li gundê Koçoman yê Cindirêsê 13 kesên din revandin. Li navenda Efrînê jî ji ber ku dagirker diziyê dikin eşîra El Bobena li dijî wan rabûn.***




Çeteyên artêşa Tirk a dagirker li navenda bajarê Efrînê bi hev dikevin.
Li gorî agahiyan li nêzî kafeteriya "Jîn Efrîn" ya li kolana Fîl a taxa Eşrefiyê ya şerên dijwar di navbera çeteyên Ehrar El-Şam û Furqet El-Hemzat de rû dan.
Hat ragihandin ku di encama şer de birîndarên çeteyan çêbûn.
Li navenda Efrînê li nêzî stasyona sotemeniyê ya kolana Fîl piştî ku çeteyan tireksek ji malbateke ji eşîreya El-Bûbena dizîn, di navbera eşîra El-Bûbena û çeteyên Ehrar El-Şam ên girêdayî artêşa Tirk a dagirker şer derket. Di şer de 3 çete birîndar bûn.

**13 KESÊN DIN REVANDIN**

Çeteyên girêdayî Firqet El Hemze ên girêdayî artêşa Tirk a dagirker 13 welatiyên sivîl ên Efrînê revandin, gel li dijî vê rabûn ser lingan. Çeteyên Firqey El Hemze avêtin ser malên li gundê Koçoman ê girêdayî navçeya Cindirêsa Efrînê 13 kes revandin. Li gorî agahiyên ji çavkaniyên herêmî hatin girtin, hate diyarkirin ku piştî ku çete welatî revandin, welatiyên gundê Koçoman li dijî dagirkeran rabûne ser lingan, heta nuqteyên leşkerên dagirker meşiyane.

## Em ê tecrîdê bişkînin, rêbertiyê azad bikin




Yekîtiya Ciwanên Şoreşger ên Swîsreyê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, bi sirûda 'Ji bo şikandina tecrîdê serî hildîn." Çalakî lidarxist.
Di pêşengtiya Yekîtiya Ciwanên Şoreşger ên Swîsreyê bi sirûda 'Ji bo şikandina tecrîdê serî hildîn' ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Helvetîaplatz a Zurîhê çalakiyek kirin.
Tevgera şoreşgerên Tirkiyeyî jî piştgirî dan çalakiyê.
Li ser navê Yekîtiya Ciwanên Şoreşger ên Swîsreyê Dersim Koçgirî axivî û da xuyakirin ku li gelemperiya Ewropa bi pêngava 'Serî Hilde' ji bo azadiya Ocalan dest bi pêngavek nû kirin û bi vê çalakiyê starta çalakiyan tê dayîn. Koçgirî bibîr xist ku wê çalakî bidomin.
Koçgirî bal kişand ser tecrîda li ser Ocalan û got: "Bi salan e tecrîda girankirî li ser Rêbertiya me dewam dike. Dixwazin me û Rêbertiya me ji hev bikin. Em vê nêzîkatiyê napejirînin. Heta rêbertiya me azad bibe, em ê li ber xwe bidin. Wê ji niha û şûnde çalakiyên me yên li Ewropayê mezin bibin û bidomin. Em carekî din dibêjin; em ê tecrîdê bişkînin, Rêbertiya xwe azad bikin."


## Dagirkeran dengbêj Hesen Ebdo revandin

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê, beriya niha bi mehekê li Efrînê dengbêj Hesen Ebdo revandin.
Agahî jê nayê girtin.
Li gorî agahiyên hatin bidestxistin, leşker û çeteyên artêşa Tirk a dagirker, mehek beriya niha li gundê Kebaşînê yê navçeya Şêrawa ya Efrînê yek ji dengbêjên navdar ên Efrînê Hesen Ebdo revandine.
Li ser aqûbesta dengbêj Hesen Ebdo agahî nayê girtin. Derbarê jiyana dengbêj Hesen Ebdo de tirs û fikar hene.



## HPG'ê derbên giran li artêşa tirk da

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HGP'ê ragihand ku li ser rêya Cizîr-Şirnex, Lêlîkan û Geverê li dijî hêzên dagirker çalakiyên 'bi bandor' lidarxistine.
Li gorî daxuyaniya navenda HPG'ê dayîn, li ser rêya Cizîr-Şirnexê 2 otobusên li nava konvoya leşkerî hatin rûxandin, li herêma Lêlîkan a Başûrê Kurdistanê jî li dijî du çeperên dagirkeran çalakî hatin kirin û li Geverê jî wesayîteke zirxî bi temamî hate rûxandin.
HPG'ê têkildarî çalakiyan ev agahî da: "Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de roja 26'ê Tîrmehê saet 21:30'î, hêzên me li dijî konvoyeke artêşa tirk a dagirker ku ji Şirnexê diçû Cizîrê çalakiyek pêk anîn. 2 otobusên di konvoyê de bi derbên giran ên hêzên me bi temamî hatin rûxandin. Di vê çalakiyê de gelek leşkerên dijmin hatin kuştin.




Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de li dijî artêşa TC a dagirker çalakî li dar xistin.
26'ê Tîrmehê saet 14:20'î li dijî artêşa tirk a dagirker a li ser girê Lêlîkanê yê li herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê çalakiyek pêk anîn. Ji du baskan ve derbên giran li çeperên dijmin hatin xistin.
27'ê Tîrmehê saet 04:40'î, li nêzî qereola Şivê ya li bajarokê Bajergeh ê navçeya Geverê ya Colemêrgê, hêzên me li artêşa tirk a dagirker a li nêzî girekî xistin. Di encamê de wesayiteke zirxî hate rûxandin. Hejmara leşkerên mirin û birîndar bûn nehate zelalkirin."

## Li Sêmalka çalakiya ciwanan berdewam dike

Çalakiyên ciwanên Rojava û Bakurê Sûriyê yên li deriyê Sêmalkayê bi armanca şermezarkirina êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser herêmên Başûrê Kurdistanê û siyasetên PDK'ê ku nahêle ciwan derbasî Başûr bibin da ku piştgiriyê bibin ciwanên Başûr didome.
Şandeyeke ji Kongreya Star û Partiya Yekîtiya Demokratîk serdana konê çalakiyê kirin.
Di bin kon de bi navê Kongreya Star Fatma Silêman nêzîkatiyên PKD'ê ku destûr nade ciwanan derbasî Başûr bibin, her wiha kiryarên dewleta Tirk a dagirker ên li djiî gelê Kurd şermezar kir.
Fatma di axaftina xwe de piştgirî da çalakiyên ciwanan û got, "Wekî Kongreya Star em amade ne piştgiriyê bidin ciwanan ta armancên xwe yên derbasbûan Başûr bi cih bînin."
Di çalakiyê de, bi navê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Raxîde Ehmed jî anî ziman ku bi destpêka Şoreşa Rojava re PDK'ê bi hemû rêbazan hewl dide li pêşiya şoreşê astengiyan derxîne. Îro jî rê nade ciwanan ku piştgiriyê bidin ciwanên Başûr li hemberî dagirkeriya Tirkiyê.
Berdevka Yekîtiya Jinên Ciwan Salîha Ebû Zeyd diyar kir pêngava wan a "Serî Hilde" berdewam e û got, "Em ji dibistana Rêberê Gelê Kurd Abdulllah Ocalan fêr bûne, em ji dagirkeran re serî natewînin, ji bo azadiya gelê bindest têkoşîna me ranawest e."




## Dibe ku şewat bi zanebûn hatibe derxistin



Hate ragihandin, şewata li Yunanîstanê ku bi rojan e dewam dike û zêdeyî 80 kesî jiyana xwe ji dest dane, dibe ku bi zanebûn hatibe derxistin. Lewma lêpirsînê dest pê kir.
Şewat bi rojane li rojhilatê Atînayê dewam dike û heta niha herî kêm 83 kesan jiyana xwe ji dest dane. Li ser şewatê lêpirsînê dest pê kir.
Alîkarê Wezîrê Karên Hundir ê ji parastina sivîl berpirsyar Nîkos Toskas îdîa kir ku 'delîlên cidî' li ber destê wan e û li gorî van delîlan şewat bi zanebûn hatiye derxistin.
Toskas di civîneke çapemeniyê de axivî û got, "Li ser şewata li Çiyayê Pendeliyê dest pê kir, gelek pirsên me hene. Ji ber delîleke girîng me pêwîstî bi destpêkirina lêpirsînê dît."
Şaredarê Pendeliyê Dîmîtrîs Stergiyû jî dabû xuyakirin ku şewat ji ber qutbûna têlên elektrîkê yên li herêma daristanî derketiye. Stergiyû diyar kiribû ku dema şewatê dest pê kir wan têlên qutbûyî yên elektrîkê dîtine.

## Qedexeya li ser PKK'ê encamê nagire

Parlamenter Jelpke nerazîbûn nîşanî Rêxistina Parastina Destûra Bingehîn da ku saziyên Kurdan krîmînalîze dike û got, "Li gorî rapora dawî, hejmara endamên PKK'ê yên li Elmanyayê zêde bûye. Ev jî nîşan dide ku qedexe bi kêr nayê."
Rêxistina Parastina Destûra Bingehîn ku saziya îstîxbarata navxweyî ya Elmanyayê ye, rapora xwe ya par roja Sêşemê ji çapemeniyê re eşkere kiribû. Di raporê de hate ragihandin ku PKK li gorî salên bihurî hêza xwe dipareze û hejmara "endam û alîgirên" PKK'ê yên li Elmanyayê 14.500 kes e. Hatibû îdîakirin ku par ev hejmar 14 hezar bû.
Di raporê de saziyên Kurdan ên weke Navenda Civaka Demokratîk a Kurd li Elmanyayê (NAV-DEM), Azadî ku ji bo mafên girtiyên Kurd têdikoşe û rojnameya Yenî Ozgur Polîtîkayê hatin krîmînalîzekirin.



Yek ji kesayetên li Elmanyayê ku nêzî têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd de Parlamentera Partiya Çep Ûlla Jeplke nerazîbûn nîşanî Rêxistina Parastina Destûra Bingehîn da û tespîtên di raporê de hatin kirin rexne kir.



# Pêşengeh ji bo pêşxistina xwendinê girîng e

***Duyemîn Pêşengeha Pirtûkan ya ku di 20'ê Tîrmehê de destpêkiribû û di 26'ê Tîrmehê de jî bi dawî bûbû. Kesên ku beşdarî pêşengehê bûn nêrînên xwe anîn ziman û diyar kirin ku pêşengehên bi vî rengî ji bo pêşxistina çanda xwendînê girîng in.***

**Melek DEMÎRTAŞ**

2.Pêşngeha Pirtûkan di bin siya Desteya Çand û Hunerê ya Kantona Cizîrê Bi dirûşmeya "Bi xwendinê em zindî dibin" di 20'ê Tîrmehê de li hola Zana ya bajarê Qamışlo hatibû li darxistin di roja 6 de bi xelatkirina hijmarek nivîskar û mêvan bi dawî bû. Ku di pêşengehê de zêdeyî 17 hezar pirtûkên cur be cur çandî, wêjeyî, civakî, siyasî û zanistî û bi 6 zimanan ( Kurdî, Erebî, Suryanî, Tirkî, Inglîzî û Ermenî) hatin pêşkeşkirin. Her wiha wêneyên fotografî yên YPG û YPJ'ê û hêzên asayîşê û ser navê Komeleya Jina Rewşenbîr tablo hatin pêşkeşkirin.
Girêdayî mijarê Rojnamya Ronahî nerîn û nirxandinên nivîskar û beşdarvan girti û diyar kirin ku Pêşngehan dê bibe pira gihandin û naskirina çandên cûda û avakirina çanda xwendinê."

**Jİ 17 HEZRAN 9 HEZAR HATE BELAVKİRİN**




Endamê Komîteya Amedekar a 2.Pêşengeha Ş.Herekol Aram Elî ser armanc, tevlîbûn û proje ev agahî dan: "Di pêşengehê zêdeyî 17 Hezar pirtûk bi 3 hezar nivîskarî û bi 6 zimanê, her wiha naverokên cûda ber xwîneran hatin raxistin; ku zêdeyî 9 hezar pirtûk li xwîneran hatin belav kirin. Di heman demê de weşanxwyên Bakur wekî Wardoz û ji Başûrê Kurdistanê Endîşe diriya pirtûkxaneyên Cizîrê beşdarbûn, her wiha du weşanxane ji Şamê wekî Tekwîn û Zeman tevlî bûn bi giştî 25 sazî û dezgehên rewşenbîrtiyê tevlî bûn."
Aram Elî da zanîn ku ji bo pêşxistina qada rewşenbîrtiyê hewldanên projeyan hene û wiha bi dawî kir: "Di projeyên avakirina pêşengehek mezin, ne tenê ji bo pirtûkan hemû rengê wêje, çandî û hunerê bi 350 bask avabikin, her wiha milê têkiliyan jî xurt bikin."

**PİRTÛKÊN KURDÎ BALA XWÎNERAN KİŞAND**



Xwediyê Pirtûkxaneya Manîsa Ji bajarê Dêrikê Azad Dawid jî wekî beşdarvan wiha pêşengeh got: "Ev cara duyemîn beşdarî pêşnegehê dibin, yekemîne bi 2500 pirtûkî, lê ya duyemîn de bi 4 hezar pirtûkî bi 600 sernivîsî û bi 3 zimanan Kurdî, Erebî û Engilîzî beşdarbûn. Lê ya girîn pirtûkên kevin dîroka wan zêdeyî sed salî beşdarbûm. ya ku bala min kişand xwîner piranî pirtûkên dîroka û çanda kurdî berin."

**PÊŞNGEH Dİ ROJAVA DE SÎNORDAR NEBE**

Azad di dawîd de sipasiya Desteya Çand û komîteya amdekar kir pêşengeh di hemû milî serkeftî bûn, tenê kêmaniya cih teng bû. Ya girîn ne tenê pirtûk, wêne û şêwekarî jî hebû, tayabet masya gilover ku nîqaşên girîn ser rola rewşenbîr, şano û ragihandin hatin nîqaşkirin ku her çiqas hind nerînên cûda hebûn jî lê, armanc yak bû ew jî hêzdayîna pênûs û nivîskaran bû, Azad wiha bi dawî kir: "Em bi hêvîne ku mîna van pêşngehan di Rojava de sînordar nemîne."

**HATİNA ROJAVA DERFETEK BÛ**



Rojnamevan û nivîskarê Mısrê Seyîd Ebdilfetah Mihemed diyar kir ku bi hatina Rojava û beşdarbûna 2.Pêşengeha pirtûk kêfxeş û destkeftiye û wiha got: "Vexwendina min derfet çêbû ez şoreş, çand nerîn rewşenbîrên rojava bi kurtasî tevgera çandê nasbikim cihê şehnaziyê ye. Di heman demê bû derfet ku bi pirtûka xwe beşdarî pêşneghê bikim, li gorî derfetên heyî û rewşa şoreşê pêşengeh bi tevlîbûn, rengê pirtûk, ziman û çand bala min kişand."

**PÊŞENGEH ÇANDA XWENDİNÊ ZİNDÎ KİR**

Seyîd bal kişand ser kêm xwendin û wiha dom kir: "Di rojhilata navînde xwendina pirtûkan kêm bûye, di virde erka rewşenbîr û desteyên çand û hunerê ku çareseriyê bibîne, ev pêşengeh jî mîna çareseriyekê ye bû."

**PÊŞNGEH PİRTÛK Jİ WİNDA BÛNÊ XİLAS KİR**

Ebdilfetah Seyîd bi van gotina dawî kir: "Da ku ez layqî vê vexwendinê bibim, dema ez herim welatê xwe, semîneran ser tevgera çand û tekoşîna Rojava bidim. Ku di10 salên dawî de tayebt ji şoreşê ku ev 7 salin pirtûk di koşeyekê de ji ihmalkirinê toz girtbû, lê em dikarin bêjin ku bi vê pêşngehê bi hezaran pirtûk û tevlî bûn ev toz ser wan pitûkan rakir û bû pira naskirina çanda hemû netewan."

**PÊŞNGEH DİYRDEYEK BALKÊŞBÛ**



Berpirsê Komeleya Suriyanî Hena Hena anî ziman ku li gorî rewşa şer û derfetên heyeî pêşngeh di warê tevlîbûn, cûreyên pirtûkan gelekî sekeftîbû û wiha got: "JI bo wê jî ev pêşngeh diyardeyek zengîne û cihê mînakê ye. Em bi 30 berhemî bi zimanê Erbî û suryanî tevlî bûn, ji ber ku Pirtûka şoreşa viyêtnamê xwendiye, ev şorea Rojava ne kêmî ya viyêtnamêye ku qada çand û rewşenbîrtiyê taybet di Cizîrê de heya astekê xwe pêşxist û nebû qurbaniya şerê taybet."
Hena wiha bidawî kir: "Tevkî tureyên civakî pêşketiye û şerê taybet di civakê tê meşandin dîsa ev pêşngeh dikarîbû bala xwenîran bikşîne ser pirtûkan, ji ber ku Rojava xwedî axek hilbirîne û gele netew û çand bi jiyanek komînal bi hevre dijîn, ev jî, sedemek ku tevlîbûnek cûrbecur çêbe."


## Çanda Kurd xwedî kenveşopiyeke xurt e

**Gulbîn BOZO**

Endamên Navenda Çand û Hunerê ya Dicle yên li Dêrikê diyar kirin ku ew xebatên xwe di çarçoveya plansaziyekê de berdewam dikin û dan zanîn ku weke heftane perwerdeyên xwe yên li ser wênesazî, muzîk, şano, dîlan û hwd, jî dibînin.

Endamên Navenda Çand û Hunerê ya Dicle ya Dêrikê derbarê xebatên xwe de nêrînên xwe anîn ziman.

Fatma Îzedîn di sala 1996'an de beşdarî xebatên çand û hunerê dibe û di beşê şano de, paşê di beşê dîlanê û herî dawî jî di koma kevneşopiyan de cih digire. Fatmayê diyar ki ku ew bi saya mamostê govendê Bavê Lawîn yê ji ber avê ew perwerde bûne û niha bûne mamoste. Fatmayê wiha got, "Em niha jî heftane perwerdeya xwe dibînin. Ez di meclîsê de di beşa çand û hunerê de cih digirim. Em weke meclîs hewl didin ku komîteyên çandê werin çalak kirin. Ji bo ku li hemû navendan xebatên me pêş bikevin nêrîn û pêşniyar ji Meclîsa TEV-ÇAND'ê re tên kirin. Em weke jinên endamên çandê yekser bi Tevgera Kevana Zêrîn ve girêdayî ne."



Endamê Koordînasyona Navenda Çand û Hunera Dicle ya Dêrikê Elî Hacî jî axivî û diyar kir ku ev xebatên çand û hunerê bi şoreşa 19'ê Tîrmehê gihiştin asta xwe ya niha û wiha got: "xebatên me yên niha hemû destkeftiyên Şoreşa Rojava ye. Di dema rêjîmê de jî komên me hebûn û me xebatên xwe yên hunerî berdewam dikir. Koma me ya kevneşopiyan di sala 2011'an de ava bû. Armanca komê ew e ku çanda bav û kalan ya kevnar biparêze. Hêjmara endamên wê 12 ne."



Elî diyar kir ku ew diçin kampa newroz perwerdeyê didin welatiyan û wiha dewam kir, "Rojane 4 mamosteyên navenda me li kampa newroz perwerdeya wênesazî, muzîk, dîlan û şanoyê didin 40 şagirtan." Elî destnîşan kir ku ew girîngiyeke mezin didin stranên dengbêjiyê û ji bo wê jî xebatên xwe yên taybet didomînin. Elî got, "li ser axa Mezopotamya gelek çand nikaribûn xwe biparêzin û tune bûn. Lê çanda Kurd xwedî kevneşopiyeke kûr e lewra jî heta roja îro hebûna xwe parastiye. Em dixwazin çand û hunera resen ya kurd bi nifşên nûhatî jî bidin nasîn da ku ew jî lê xwedî derkevin û biparêzin."




## Hozan Fadilê Cizîrî



**Sîpan ŞÎNDA**

Guleke din jî ji nava baxê gulistana strana Kurdî çilmisî. Stêrkeke din a pirr geş vemirî ji nav stêran. Bilbilekî din jî bi kul û derdê gulê ve bû rêwingiyê riya bêveger. Dengbêj û hozanê mezin Fadilê Cizîrî di 25.07.2018 an de, bi kul û derdên xwe yên bê derman çû li ser dilovaniya xwe. Ez bawer dikim heçî guhdariya dengê Hozan Fadil kiribe, ew bûye heyranê dengê wî. Heçî di sihbeta wî de rûniştibe û şehdebîniya dengbêjiya wîkiribe bûye evîndarê deng û dengbêjiya wî. Ew evîndarê dengbêjiyê bû. Ew hostayê dengbêjiyê bî. Dema ewî destê xwe dibir li ber guhê xwe û stran digot, ne ew jê têr dibû, ne ji guhdarvan ji deng û stranên wî têr dibîn. Ewî ji bo kelepora strana Kurdî ji salên 1980 an ve dest bi qeyd kirina dengbêjiya xwe kiriye. Wê demê Zekî Demîr li Cizîra Botan karê firotina bandên denga dike. Ya rast ew ne tenê difiroşe, ew bi xwe kesekî evîndarê strana Kurdî ye. Gelik dengbêjên herêma Botan tên li cem wî û ew dengê wan qeyd dike. Yek ji van dengbêjan ji hozanê nemir Fadil e. Li gor kek Zekî dibêje ew banda Fadil ya yekem di 1983 yan ji 1984 ê de tomar dike. Ji beriya Fadil, dengê birayê wî ji tomar dike. Lê dengê Fadil û hostahiya wî dengbêjên herêmê di bin siya xwe de dihêle. Li gor hozanê me digot, ew ji diya xwe elimiye stranan û dengbêjiya wî ji bi saya serê diya wî ye. Banda wî ya herî jê tê hezkirin di 20.02.1988 an de bi navê "hejmara 3" yan dîsa ji aliyê Zekî ve tê tomarkirin. Ewî gelik ji "payîzokan" dikir. Ewî her tim payîzok û stranên eşqê digotin. Di bandên xwe de ji piranî payîzokan dibêje. Stranên Heyran, Mihemed Beg, Yexmîr Axa, Xeco, Seydiko, Aso, Sewdaliyê, Hey Limin, Sahîno, Hesamê Axê, Hosta Hene, Yarê... dibêje. Carna ji lawik û stranên şera digotin bes kêm. Hozan Fadil gelik hij kewan û kewgîrvaniyê, seyd û nêçîrê ji dikir. Ewî di salên ciwaniya xwe de gelik kewgîrvanî ji kiriye û li herêma botan geraye. Li gelik kûçke û dîwanxana de dengbêjî kiriye. Demekê debara xwe bi firotina misk û ember, bandên dengbêjiyê bi seyarî kiriye. Piştî salên 1990 an de, dikeve bajarvaniya Cizîrê de û heya teqawît dibe li wir de dixebite.

Hozan Fadil bi gelik dengbêjan re ji dengbêjî kiriye, wan bi hevre gelik bêlîte, lawik û payîzok gotine. Ewî pirr ji civatên dengbêjan hez dikir, weke kewê ribat her tim dixwirî. Ew derketiye bernamên gelik televizyonan ji û wî stran gotine. Lê mixabin di nava van deh salên dawî de nexweşiyek giran (parkinson) girt û nekarî baş tedawî bibe. Ji ber wê her kû diçû nexweşiya wî lê pîr bû û çare jê nekir. Di nava salekê de kurek yê wî di qezayê de û yek ji di qedexa Cizîrê de jiyana xwe ji dest didin. Evê ji nexweşî û êşa wî mezintir dike. Raste mirin ne kurê kesêye Bilbilê Botan! Lê tu serwerê dengbêj û aşiqayî, tu bilbilê cihê botayî! Cihê te biheşt be! Te digot:

Belê gava wezê bi mirim min nebin nava ti miriyan
Hey belê tirbika min çêkin li serê çiyayek ji wanê bilind
Ay pêjberî wan her dû geliya
De bila li ser singê min evdalê xwidê bibe, sahiyana berê sibê re, terqîna şaxigê van nêriya
Evdala xirabo, mane wez pîr dibim ay dilê rezîl çima tu pîr nabî!


# Li Tirbesipiyê çandinî ji nûve geş dibe

**Li Tirbesipiyê çandinî ji nûve pêş dikeve û geş dibe. Tirbesipiyê bi çandiniya xwe bi nav û deng e û erdê wê jî ji bo vê kêrhatiye. Cotkarên Tirbesipiyê piştî ku Saziya Çandiniyê piştgiriya pêwîst da wan ji nû ve dest bi çandiniya sebze û pembû kirin.**



Piştî bicihanîna hinek daxwazên cotkaran, çandiniya sebze û pembo li Tirbespiyê geş dibe. Cotkarên navçeyê di vê salê de 12 hezar û 251 donim zevî çandine. Cotkarên navçeya Tirbespiyê, piştî ku Saziya Çandiniyê piştgiriya pêwîst dayê, ji nû ve dest bi çandiniya sebze û pempo kir. Di salên dawîn de çandinî li navçeyê ji ber kêmbûna semad û dermanan paşde mabû.
Vê salê qadên ku bi sebzeyên havînê hatine çandin 8 hezar û 290 donim û bi pembo 3 hezar û 961 donim e.
Bi destpêka vê salê re Saziya Çandiniyê ya Tirbespiyê ji bo naskirina sedemên paşdeçûna rêjeya çandiniya sebze û pembo li herêmê û ji bo pêşxistina wê, rêzecivîn ji cotkaran re li dar xistin.
Di civînan de pirsgirêkên ku li ber çandiniyê li herêmê dibin bend, hatin naskirin, jê; kêmbûna mazotê û tunebûna dermanên kurmik û kêzikan.
Li ser wê Saziya Çandiniyê rêjeya mazotê kir du qat. Nêzî 1 milyon lître mazot li ser cotkaran bi destpêka werza çandiniyê re belav kir.
Ji bo rêgirtina li ber belavbûna nexweşiyan di nav zeviyan de, Saziya Çandiniyê dermanên kêzikên bi zirar belav kirin. Her wiha semad li gorî pêwîstiya cotkaran belav kir.
Endamê rêveber ê Saziya Çandiniyê yê Tirbespiyê Mihemed Emîn Musa diyar kir ku sazî bi armanca zêdekirina hilberîna çandiniyê û bi armanca bicihanîna pêwîstiya navçeyê ya çandiniyê, hemû pêwîstiyên cotkaran pêşwazî dike. Navçeya Tirbespiyê bi çandiniya sebze û pembo navdar e…*ANHA*

## Pêngava paqijkirina şûnwaran hat destpêkirin




Muduriyeta Tûrîzmê ya girêdayî desteya Tûrîzm û Şûwaran a herêma Cizîrê dest bi hemleya paqijkirina cihên tûrîzmê û perezgehên xwezayî, kir.
Muduriyeta Tûrîzimê ya herêma Cizîrê bi armanca paqijkirina cihên şûnwaran û perezgehên xwezayî dest bi hemleya paqijkirinê ya wan deveran, kir.
Di vê çarçoveyê de buroya raghandinê ya Muduriyeta Tûrîzmê ya Qamişlo ragihand ku wan di 24`ê tîrmehê de dest bi hemleya paqijiyê kirine û wê hemleya wan heta dawiya mehê berdewam bike.
Derbarê mekanîzmeya kar û çalakiyên li herêmê buroyê da zanîn ku wan bi hevkariya şaraderiyên gel ên hemû herêm û naçeyan dest bi pêngava paqijkirina cihên tûrîzmê û perezgehên xwezayî kiriye…*ANHA*

## Pirsgirêka avê ya koçberan çareser bû



Rêveberiya Kampa El Erîşê 3 bîr di nava kampê de kola û pirsgirêka avê ya koçberan çareser kir.
Bi zêdebûna germê re koçberên li kampa El Erîşê ji ber kêmbûna avê zehmetî dikişandin. Bi armanca çareserkirina vê pirsgirêkê rêveberiya kampê bi alîkariya saziyên ku di nava kampê de dixebitin 3 bîrên avê kolan.
Ji bo gihandina avê ji bîran heta kampê, koçberan alîkariya rêveberiya kampê kirin û ji bo av bigihîje hemû koçberan xetên avê kolandin.
Piştî bicihanîna daxwazên koçberan û vekirina xetên avê, koçberê bi navê Xelef El-Wekaa yê ku ji şêniyên Dêrazorê ye got: “Me ji ber kêmbûna avê zehmetî dikişand. Lê piştî kolandina bîran, wê ti kêmasiya avê nemîne.
Welatiyê bi navê Ehmed El-Elî jî wiha got piştî ev birên avê hatin kolandin wê êdî pirsgirêkên avê çareser bibe.
Welatiya bi navê Esmaa El-Zayid li ser kolandina xetên avê axivî û wiha got: “Me ev xetên avê bi armanca gihandina ava bîran ji kampê re kolandin. Ji ber kêmbûna avê gelek nexweşî di nav kampê de belav bûn û her wiha ava vexwarinê jî kêm bû.”…*ANHA*

## Pirsgirêka qirêjiya avê çareser bû



Muduriyeta avê ya bajarê Dêrîkê pirsgirêka qirêjbûna ava vexwarinê li taxên Xêrka û Sor çareser kir.
Piştî agahdariya şêniyên taxên Xêrika û Sor ên bajarê Dêrikê ku hinek qirêjî di ava vexwarinê de heye, Muduriyeta Avê piştî lêkolînkirinkirinê, derket ku hinek mazot ji xortûma depoya mazotê ya welatiyekî gihiştiye şebekeya avê.
Hevserokê Muduriyeta Avê Mihemed Emîn Hecî tekez kir piştî tespîtkirina sedema qirêjbûna avê, wan yekser mudexele kirin û xetên avê ji bermahiyên mazotê paqij kirin. Her wiha Hacî bang li şêniyan kir ku henefiyên avê vekirî bihêlin da ku ava bi mazotê qirêj bûye bi temamî ji xetên avê vala bibin…*ANHA*

## Paqijiya li gundewarên Dêrazorê didome



Komîteya Xizmetguzarî û şaredariyan di bin çavdêriya Meclisa Sivîl a Dêrazorê de bi armanca rakirina sergoyê ji rêyên gundewarên rojhilat û rojavayê Dêrazorê, dest bi pêngava paqijiyê ya bi navê “Hemleya Firatê” kir.
Alavên paqijyê dest bi rakirina sergo û bermahiyên xirakirinê ku ev 7 sal e hatiye paşguhkirin, kir. Ji ber vê yekê rê hatin girtin, şêniyên herêmê jî ji ber vê yekê gelek zehmetiyan dibînin û nexweşî belav dibin.
Meclisa Sivîl a Dêrazorê û komîteyên xizmetguzariyê piştî civîna xwe lidarxistin bi awayekî lez dest bi amadekariyên projeya “Hemleya Firatê” kir.
Piştî civînê projeya paqijkirinê li gundewarên rojava û rojhilatê Dêrazorê dest pê kir. 92 karker tev li pêngavê bûne. Pêngav ji gundê El-Cenîna yê gundewarên rojavayê bajêr destpê kir û wê heta herêma El-Cezrat berdewam bike.
Meclisa Sivîl a Dêrazorê cihek li çolistanê diyar kir da ku sergo lê were komkirin. Li wê derê kortek bi kûrahiya 15 metreyan hate kolandin da ku çop têde were veşartin û ji bo ku nexweşî jî belav nebin.
Her wiha meclisê 197 selikên çopê û 47 erebeyên biçûk ji bo komkirina çopê diyar kirin.
Yek ji rêveberên Komîteya Xizmetguzariyê ya Meclisa Sivîl a Dêrazorê û berpirsê projeya paqijkirinê Yasir El-Ewad diyar kir ku ev çend roj e wan dest bi paqijkirinê kiriye û wê 5 mehan berdewam bike.
Hate zanîn ku 282 hezar dolar ji bo vê projeyê hatiye veqetandin.
Piştî ku gundewarên rojhilat û rojavayê Dêrazorê ji aliyê şervanên QSD`ê ve ji çeteyên DAIŞ`ê hatin rizgarkirin, Meclisa Sivîl a Dêrazorê bi hemû hêza xwe xizmeta şêniyên herêmê dike… *ANHA*

## Li Kobanê dewreya perwerdê hat vekirin

Bi armanca bilindkirin û pêşxistina asta xwendekarên bajarê Kobanê û gundewarên wê, Rêveberiya Dibistanan a girêdayî KPC-Demokratîk dewreyeke perwerdeyê da destpêkirin.
Rêveberiya Dibistanan a girêdayî Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC-Demokratîk) bi armanca bilindkirina asta xwendekaran dewreyeke perwerdeyê vekir. Di perwerdeyê de waneyên tên dayîn ev in: Zimanê îngilîzî, zimanê erebî, zimanê kurdî û bîrkarî (matematîk). Heke şagirtên dewreyê bixwazin wê waneyên fizîk û kîmyayê jî wergirin. Şagirtên ku di dewreya perwerdeyê de tên qebûlkirin ên amedehiyê û navîn in. Heta niha nêzî 300 şagirt tev li perwerdeyê bûne. Deriyê qebûlkirina şagirtan jî her tim vekirî ye.



Perwerde li Dibistana Şehîd Azad Kobanê ya li bajarê Kobanê hatiye vekirin. Perwerde saet di 16:00’an d dest pê dike heta 18:00’an didome.
Heta destpêkirina dibistanan wê perwerde vekirî be, eger cih hebe wê perwerdeyên bi vî rengî piştî destpêkirina dibistanan jî dewam bikin.
Têkildarî mijarê endamê Rêveberiya Dibistanan Aras Ebdulrehman ev tişt anî ziman: ″Armanca me ji vekirina perwerdeyê ew e ku şagirtên ku asta wan ne zêde ye, asta wan bê bilindkirin û ji xwendinê dûr nekevin.″
Her wiha kesên bixwazin fêr bibin û ne xwendekarên dibistanan bin jî, dikarin li gorî xwesteka xwe cihê xwe di perwerdeyê de bigirin…*ANHA*



# Jinên Kurd serkeftî û berxwedêr in

***Duyemîn konferansa Kongreya Star ya Şehbayê bi duruşmeya “bi rihê berxwedana serdemê em ê şoreşa jinê civakî bikin” di 26’ê Tîrmehê de bi beşdariya 500 delegeyan hat lidarxistin. Di konferansê de biryarên girîng hatin girtin. Berdevka Kongreya Star a Evîn Siwêd konferans nirxand û diyar kir ku berxwedana jinên Efrînê mohra xwe li konferansê xist.”***





Derbarê 2’yemîn Konferansa Kongreya Star a li Şehbayê, Berdevka Kongreya Star a Evîn Siwêd da zanîn ku ev konferans wê rê li pêşketinên mezin veke.
2’yemîn Konferansa Kongreya Star bi dirûşma “Bi rihê berxwedana serdemê em ê şoreşa jinê civakî bikin” roja 26ê vê mehê li Şehbayê hat lidarxistin. Li gelek herêmên weke Efrîn, Kobanê, Şehba û Şêxmeqsûd 500 delegeyên jin beşdarî konferansê bûn. Di konferansê de biryarên girîng hatin girtin.
Derbarê konferansê de berdevka Kongreya Star Evîn Siwêd diyar kir ku lidarxistina konferansa Kongreya Star a li Şehbayê gavek girîng e û got: “Berxwedana jinên Efrînê mohra xwe li konferansê xist.”
Evîn Siwêd da zanîn ku ji her pêkhateyên Bakurê Sûriyê jin beşdarî konferansê bûn û got: “Ji ber ku ji her pêkhateyê Bakurê Sûriyê jin beşdar bûn û li wan jî hatin guhdarkirin ev ji bo pêşketinên nû girîng e. Diviyabû ku me di serê meha Adarê de ev konferans lidarbixista lê ji ber êrîşên dewleta tirk ên li ser Efrînê me taloq kir. Niha li seranserê Rojava konferansên me pêk tên. Hêviya me ew e ku di encama van konferansan de ji bo Rojava û tevahî Bakurê Sûriyê serkeftin û pêşketinên hêja bê bidestxistin.”
Evînê anî ziman ku ji bo ev konferans pêk werin wan gelek hewl dane, gelek civîn li dar xistine û wiha dewam kir: “Gelek civîn me beriya konferansê li dar xistin û me rewşa jinên Rojavayê Kurdistanê û tevahî Bakurê Sûriyê raxist pêş çavan. Tiştên ku di konferansê de herî zêde derket pêş jî berxwedana jinên Efrînê bû. Berxwedana jinên Efrînê mohra xwe li konferansê xist.”
Berdevka Kongreya Star Evîn Swêd destnîşan kir ku biryarên konferansê ji bo wan girîng in û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Dê di çarçoveya biryarên girîng de xebatên me bidome. Ji bo jin di civakê de bikaribin mafên xwe biparêzin û li ser lingên xwe bisekinin em ê xebatên xwe bidomînin. Ev konferans wê rê li pêşketinên mezin veke. Jinên Kurd her dem jêhatî û serkeftî ne. Loma dema ku ji Efrînê derbasî Şehbayê bûn li wir berxwedana xwe dewam kirin û karê xwe bi rengekî serkeftî dan meşandin. Derbarê jinên Şehbayê de ew ê biryarên girîng bê stendin. Ji bo projeya rizgarkirina Kantona Efrînê her kes bi can, mal û berxwedana xwe hewl didin û ev berxwedana di konferansê de jî derket holê.”…*Şêrîn Zêrevan /Şehba*

## Zewaca temenê biçûk qetila jiyanê ye



Binevş SARYA

Li gelek deverên Rojhilata Navîn zawaca temenê biçûk bi awayek ji rêzê tê dîtin û zarokên di temenê 11-12 salî bigire heya diçe 18-19 sali yê. Di temenê biçûk de zewac bi her awayî xirab û xetere. Çi dibe bila bibe pêwîste ku mirov zarokan nezewicîne. Berî her tiştî zewaca temenê biçûk ji boyî biyolojiya mirovan xetere, bi taybetî jî ji bo zaroka keçik hîn bi xetertire. Beden heta ku kamil nebe, nabe ku zarok têkiliya cinsî bijîn. Ji xwe jinek ciwan welatê ku lê dijî çendî germ be jî, herî zû di 13 de saliya xwe de regil (ketina Dewre, cilan) dibe. Jin heta regîl nebe bedena wê jî kamil nabe. Dayîktî wisan hest an jî mijarek ji rêzê nîne bêgûman. Berî ya her tiştî ji bo zewacê aqilek selîm û vîna kesan girînge. Di zewacê de ger vîna kesên ku dizewicin li ber çav neyên girtin wê dawiya wê zewacê têkçûn be.
Em pir dûr li çareseriya negerin, her kes dikare bibe hêza çareseriya pirsgirên welat an jî cavaka xwe. Berî her tiştî hişmendiya ku mêrê serdest bi civakê û jinan daye bawer kirin ku dema jinek li ser temenê 16-17 salî ket û nezewicî be wê di malde bimîne pêwîste ku mirov vê hişmendiya xelet û bi tehlûke di civakê de bide guherîn. Ji bo ev pirsgirêk di civakan de were çareser kirin berî her kesî û her tiştî girînge ku jin ji hêza xwe ya cewherî bi bawer be. Hişmendî ya mêr wisan kiriye ku jin ji hebûn û bedena xwe fedî bike, bi civakê dane bawerkirin ku ger jin di bin parastina mêran de nebe wê nikaribe bijî. Yê ku nahêle jin bi hêza xwe bijî gelo kî ye?
Dema ku tu ji kesekî re 40 caran bêjî tu dîn î. Bêgûman wê ew jî bawer bike ku dîn e. Di civaka me de ev 5’hezar sale ku ji jinan re gotine tu nikarî, nezanî, bê hêzî û mecbûrî ku di bin parastina mêrekî de bî. Ma gelo dema ku te zayendek bi van xalan da bawerkirin gengaze ku bikaribe bi hebûn û zayenda xwe bawer be. Ji ber ku di civakan de di hemû deman de ji jinan re gotine tu nikarî û nizanî jinan jî wisan bawer kiriye ku nikare û nizane ji ber wê mêran gelek caran weke xwestiye destihladariya xwe li ser civakê dane meşandin. Ger di civakê de zayenda jin weke mirov bi hati bûya hesab wê tû caran jin nehat bûna firotin. Navê firotina jinê xemilandine da ku jin bixwe jî jê aciz nebin, kirine qelen, next an jî li hinek deveran kirine perê heqê şîrê dayîkê ma gelo dayîk şîr nade kurê xwe jî? Lê tenê di civakan de jin tên firotin. Ji xwe hişmediya ku mirovan bifroşin bi her awayî xelete û ne li gorî ehlaqe. Zewac ne tiştek şaşe, lêbelê zewaca di temenê biçûk de, kirîn û firotina mirovan şaşe. Zewaca temenê biçûk hem di wateya biyolojîk û hem jî ji bo avakirina malbatek bi tendurist xetere. Li gorî we zarokek wê bikaribe zarokan perwerde bike? Dema ku tu kesekî di temenek biçûk de bizewicînî piştî ku bû kesek ciwan yanî bû 18-19 salî wê lêgerînên wan cûda bin. Ji ber zewaca temenê biçûk pirsgirêkên hev dû berdanê jî di nava civaka me de zêde ne. Dema ku dayîk û bav hevdû cûda dibin bêgûman jiyana zaorakan jî ser û binê hev dibe û derûniya zarokan jî pê re xirab dibe.

## Bawerî û tekoşîn pênûsê bi hêz dike



Ferîşte NEZÎR

Jina rewşenbîr roleke pir girîng di avakirin û pêşxistina civakê de, di şikandina sîstema desthilatdar de dilîzin. Ji bo wê jî hişmendiya rewşenbîrên azad mîsogeriya netewa demokratik. yek ji jinên ku bi tekoşîn û bawerî pênûsa xwe bi hêzkir û nivîsand Narîman Evdikê ser sedema kêm hêz û bawerî û çawa sê çîrokên xwe nivîsand ji Rojnameya Ronahî re vegot.

### ZEYÎFBÛN Jİ KÊM BAWERÎ YE

Endama Komîteya Wêjey kurdî ji bajarê Serê Kaniyê Narîman Evdikê yek ji jinên ku bi berhemên xwe beşdarî 2.pêşengehê bû derbarê nivîsên xwe wiha got: “Ji temenê 18 salî min bi zimanê kurdî dest bi nivîsê kir, lê di her nivîsandin de ji kêm bawer bûn ew nivîs diqtand û mafê hiştinê ne didayê. Dibe ku ev sedema kêm zabenûn, civak anjî jiber ku bavê min di milê ziman de xurte ji tirsa ku şaştî hebe min ew nivîs diqetand, lê her sedema bingehîn jî kêm bawerî bû.”

### ZANEBÛN Û TEKOŞÎN HÊZ DİDE

Narîman da zanîn ku bi armamca xurtkirina asta ziman û naskirina wêjeya kurdî derbasî akadimiya Ceger Xwîn ya bakurê Kurdistanê bûm û wiha pêde çû: “ Li akadimiyê ketim ferqeya nivîs û hêz, her wiha bandoriya wê ser pênûsê. Mamosteyan jî ferqkirin ku asta minî nivîsê heye, ji bo wê jî gotin erê wêjeya kurdî di warê xurtkirina nivîsê de alîkare, lê ew tenê têrê nakê, wê demê min naskir ku dema tekoşîn û asta zanista wêjeyî hebe wê, wê bawerî û pênûs bi hêzbe.”

### BİRYARA XWE PÊK ANÎ

Narîman diyar kir ku di 1.Pêşngeha pirtûka Ş.Herkol li Rojava tenê wekî komîteya amedekar tevlî bû û wiha dom kir: “Akadimiya Ceger Xwîn û pêşngeha yekemîn hêzda ku ez êdî bi nivîsên xwe beşdarî bibim, di 1.pêşngehê de biryar da ku di sala bê de bi berhemên xwe beşdar bibim. Min biryara xwe pêk anî û di 2.pêşngeha pirtûkan bi 3’ê çîrokan tevlî bûn.”

### Bİ BERHEM TEVLÎ BÛM


Di çarçoveya danesîna çîrokên ku tevlî pêşngehê bû Narîman wiha got: “Pirtûk an jî 3 çîrok du ser jinê û yek ser hevalek şehîd beşdarî pêşngehê bûm. Çîroka bi navê “Xwnên bi êş” ser şehîd Dîrok ji Amûdê ye, ev çîrok ser hind nivîsên wê malbat gihand me û agahiyên hevalên wê ev çîroka ser zaroktaya wê heya tevlî bûn û şehadeta bi alîkariya Botan nivîsand. Her wiha herdû çîrokê din ser jinê ye, yek bi navê “Çima” ku ew jin di her tişta jiaynê wê de bi çima derbas dibe, heya dawiyê dibêje ma ew nebe her derbas dibe ma ji bo wê jî navê çîrokê “Çima”ye.”

### JİN XWEDÎ HÊZA VEŞARTÎYE

Narîman Evdikê bal kişand ser pêşngehê û got: “Di her milî nivîs, çîrok, helbest, şêwekarî û wênede, her wiha di her baskekî pêşngehê de jin bi rengekî cihê xwe girt ev bi serê xwe serkeftin û hêzdayîna pênûsa jinê ye. Ev tê wateya ku êdî jin dîroka xwe bi pênûs û rengê xwe binivîsîne. Narîman wiha bi dawî kir: “Wekî biryar ku di sala bê de bi pênûsa xwe tenê, çîrokê û berhemên nû tevlî pêşngehê bibim.”

## Jin wê bi jineolojiyê rizgar bibin

Endamên Komîteya Jineolojiyê yên Hesekê diyar kirin ku Jineolojî tê wateya bîrdozî, felsefe û rastiya jiyanê û gotin: “Jineolojî rêbaza parastina xwezayê û mafê jinê ye.”
Endamên Komîteya Jineolojiyê yên Hesekê derbarê xebat û armanca Jineolojiyê de da zanîn ku wê Jineolojî bibe bersiva koletî û desthilatdariya li ser jinê û gotin: “Bi saya Jineolojiyê dê jin ji zilma hişmendiya baviksalarî rizgar bibin.”
Endama Komîteya Jineolojiyê Dîlan Hiso diyar kir ku ji bo pêşxistina xebatên Jineolojiyê li her bajarekî wê Komîteya Jineolojiyê were avakirin û wiha got: “Ji bo di warê Jineolojiyê de pêşketinên ber bi çav pêk were rêxistinbûyin girîng e. Ji bo hemû jin bi rêxistin bibin wê li her bajarî Komîteya Jineolojiyê ava bibe. Dema ku jin xwe bi rêxistn bikin ew ê zincîrê koletiyê bişkînin û li ser piyên xwe bimînin.”
Endama Komîteya Jineolojiyê Bêrîvan Husên da zanîn ku wateya Jineolojiyê rastiya jiyanê derdixe holê û wiha got: “Jineolojî têgehek resen e. Dema wateya Jineolojiyê bê famkirin wê pirsgirêkên civakê jî bên çareserkirin. Wê di çarçoveya parastina xwezayê de pêşketinên ber biçav pêk were. Lewra Jineolojî rêbaza parastina xwezayê û mafê jinê ye. Bi saya Jineolojiyê wê jin ji zilma hişmendiya baviksalarî rizgar bibin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di parêznameya Sosyolojiya Azadiyê de Jineolojî pêşniyar kiriye. Loma divê civak û bi taybet jin vê wateyê baş fam bikin.”…*Ronîda Hacî /Hesekê*



# MSD'ê serdana Şamê kir

*MSD xebatên xwe yên ji bo çareseriya aloziya Sûriyê û demokratîkbûna Sûriyê bê navber didomîne. Heta niha MSD'ê ji bo çareseriyê gelek proje pêşkêşkirine û gelek caran eşkere kiriye ku ew ji danûstandinê re amade ne. Heyetek ji rayedarên payebilind yên MSD'ê li ser vexwendina hikûmeta Sûriyê bi awayekî fermî serdana Şamê kir.*

Heyetek ji Meclîsa Sûriya Demokratîk, li ser vexwendina hikumeta Sûriyê bi awayekî fermî serdana Şamê kir.

Li gorî nûçeya ANHA'yê, heyeta MSD'ê li ser bingeha diyaloga navbera her du aliyan serdana Şamê kir.

Li ser mijarên ku di navbera her du aliyan de hatine nirxandin hîn agahiyeke zelal bi dest neketiye.

Li gorî Ajansa Nûçeyan a Fransayê (AFP), Hevserokê MSD'ê Riyad Derar diyar kir ku li ser vexwendina hikumeta Beşar El Esad wan 'yekemîn serdana xwe ya fermî ya li Şamê' pêk anîne.

Derar got, "Em li ser çareseriyeke ji bo Bakurê Sûriyê dixebitin" û destnîşan kir ku ew hêvîdar in encameke "erênî" ji hevdîtinê derkeve. Derar got, di hevdîtinan de ti pêş şert nehatine destnîşankirin.

Tê gotin ku heyet ji rayedarên payebilind ên siyasî û leşkerî pêk tê.



## Li dijî êrîşan yekîtiya gelê Kurd pêwîste



Endamê Komîteya Giştî ya Partiya Demokratîk a Kurd Li Sûriyê Fethullah Hiso diyar kir ku dewleta tirk hewl dide bi rêya Peymana Mîsakî-Milî gelê kurd ji holê rake û destnîşan kir ku divê hikumeta başûrê Kurdistanê sînorekî ji bo zêdegaviyên Tirkiyê yên li Başûr deyne.

Têkildarî çareseriya pirsgirêka kurd û parastina gelê kurd ji êrîşên derve, endamê Komîteya Giştî ya Partiya Demokratîk a Kurd Li Sûriyê Fethullah Hiso axivî û diyar kir ku gihiştina hemû aliyên kurd ji çareseriyeke siyasî re, ji bo parastina gelê kurd ji hemû êrîşên derve bi taybet êrîşên dagirkeriya tirk pêwîste û ew jî bi lidarxistina kongreya netewî ya Kurd pêkan e.

Hiso di axaftina xwe de destnîşan kir ku dagirkeriya tirk hewl dide Peymana Mîsakî-Milî pêk bîne û wiha got: "Tirkiye armanc dike ku gelê kurd ji holê rake û bi taybet li başûrê Kurdistanê. Lewre divê Hikumeta Başûrê Kurdistanê bi awayekî cidî li hemberî êrîşên dewleta tirk li ser başûr bisekine û destûr nede ku dewleta tirk xaka wan dagir bike."

Hiso destnîşan kir ku Tirkiye bi rêkeftinekê bi Rûsyayê re û di nav bêdengiya navneteweyî de Efrîn dagir kir û 17 navendên leşkerî li başûrê Kurdistanê ava kirin û wiha dewam kir: "Tirkiye bi bêdengiya Hikumeta Başûrê Kurdistanê dixwaze Kurdistanê bi awayekî berebere dagir bike." Hiso, ji bo sekinandina êrîşên Tirkiyê, ji partiyên kurd xwest ku kongreya nîştîmanî ya Kurdistanî li dar bixin.

Hiso destnîşan kir ku yekemîn hêza ku li dijî referanduma başûrê Kurdistanê sekiniye dewleta tirk bû. Hiso got, "Dewleta Tirk, Hikumeta Başûrê Kurdistanê bi komkirina hêzên xwe yên leşkerî li ser sînorên başûrê Kurdistanê tehdîd kir. Ji ber wê divê partiyên ku li gorî siyaseta Tirkiyê kar dikin, jê dûr bikevin û li gorî berjewendiya gelê kurd bixebitin.

Têkildarî êrîşên dewleta tirk li ser başûrê Kurdistanê Hiso ji hikumeta Iraqê xwest ku li dijî êrîşan bisekinin û wiha got: "Tu qanûnek ne ji Tirkiyê re û ne ji tu dewletekî din re destûr nade ku derbasî xaka dewletên cîran bibe û êrîşan pêk bîne. Her wiha divê hikumeta Iraqê li hemberî van êrîşan bê bertek nemîne".

Di dawiya axaftina xwe de, endamê Komîteya Giştî ya Partiya Demokratîk a Kurd Li Sûriyê Fetullah Hiso wiha got: "Em gelê kurd hewl didin dewleteke demokratîk pirrengî hemû pêkhateyên xwe qebûl dike, ava bikin û em wek gel ji aliyê hinek dewletan û bi taybet dewletên ku li ser Kurdistanê serwer in hedef hatine girtin. Ji erka me ye çi li Rojava dibe û çi li Başûr dibe parastina gel û axa xwe bikin."...*ANHA*

## TJA'yê ji bo Şengalê bang li NY'ê kir



Tevgera Jinên Azad (TJA) bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) kir û jê daxwaz kir ku ji ber destpêkirina êrîşên li hemberî Şengalê, roja 3'ê Tebaxê wek "Roja Çalakiya Navneteweyî ya li Dijî Tevkujiya Jinê û Qirkirinê" binase.

Tevgera Jinên Azad (TJA) têkildarî salvegera êrîşên DAIŞ'ê yên li ser Şengalê ku di 3'ê Tebaxa 2014'an de destpêkirin û di encamê de bi hezaran Êzîdî hatin qeitlkirin, revandin û koçberkirin daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku DAIŞ'ê di 3'ê Tabaxa 2014'an de bi hevkariya hêzên emparyalîst û dewletên herêmê warê pîroz ê êzîdiyan Şengalê dagir kirine.

Di daxuyaniyê de reva peşmergeyan a dema êrîşên li ser Şengalê tê bibîrxistin û ev tişt tê vegotin: "Ji ber peşmergeyên ku ji parastina Şengalê berpirsyar bûn çekên xwe yên giran hiştin û reviyan, li Şengalê qirkirin pêk hat. Wê demê 6 hezar jin û zarokên êzidî wek ganîmeta şer dîl ketin destê çeteyan, rastî îstîsmara komî ya çeteyan hatin û li bazaran wek koleyên seksê hatin firotin. Êzîdiyên ku ola xwe neguherandin hatin îşkencekirin, îstîsarkirin û qetilkirin. Li gel ku ji destê çeteyan gelek jinen êzîdî hatin rizgarkirin jî hê di destê çeteyan de 3 hezar 500 jinên êzîdî hene."

### BERXWEDANA JINAN

Di dawiya daxuyaniyê de berxwedana ku bi pêşengiya jinan li hemberî çeteyan hat dayîn jî hat bibîrxistin û ev daxwaz hat kirin: "Em wek Tevgera Jinên Azad (TJA) bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) dikin û jê daxwaz dikin ku ji ber destpêkirina êrîşên li hemberî Şengalê, roja 3'ê Tebaxê wek "Roja Çalakiya Navneteweyî ya li Dijî Tevkujiya Jinê û Qirkirinê" binase."

## HDP'ê nameya piştgiriyê ji Yunanîstanê re şand

HDP'ê ji ber şewata li daristanên Yunanîstanê nameyek ji partiya Syrîza ya li desthilatdariyê re şand û peyama piştevaniyê da.

Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ji ber şewata li daristanên Yunanîstanê ku 83 kesan jiyana xwe ji dest dan û 180 kes jî birîndar bûn nameyek piştevaniyê ji Yunenîstanê re şand.

Name bi mohra Parlamenterê Îzmîrê û Alîkarê Hevserokên Giştî yê ji Ekolojiyê Berpirsyar Mûrat Çepnî hat şandin.

Di nameyê de hat gotin, "Li erdnîgariya ku hûn lê dijîn, daristanên li herêma Rafîna û Kînetayê tevî hemû zindiyên di nav de, li gel xizmên me, malên we, dehl û rezên we dişewitin û dilê me jî bi wan re dişewite. Em bi vê êşê zanin û baş nas dikin."

Çepnî diyar kir ku ew sînorê navbera xwe nas nakin û got, "Em bi we re ne. Em amade ne birînên we bipêçin, qadên xwezayî biparêzin û çi ji destê me bê em amade ne bikin."



## Tenê YBŞ dikare gelê Êzidî biparêze



Şervanên YBŞ'ê diyar diyar kirin ku tenê YBŞ dikare birînên gelê Êzidî derman bike, gelê Êzidî ji fermanan biparêze û rê nede komkujiyên din.

Di 3'ê Tebaxa sala 2014'an de çeteyên DAIŞ'ê êrîşê ser Şengalê kirin û di encamê de bi hezaran welatî hatin kuştin û revandin. Bi boneya 4'emîn salveger fermana 74'an ya li ser gelê Êzîdî pêkhatî şervanên YBŞ'ê axivîn.

Şervanê YBŞ'ê Qîran Şengalî bal kişande ser pêwîstiya damezrandina YBŞ'ê û got; "Damezrandina YBŞ'ê bi armanca avakirina xeta parastin û xwedî derketina gelê Êzidî ye. Hemû civak jî dizane ji derveyî keç û xortên Şengalê tu kes nikare parastina xaka Êzidxanê bike. Armanca YBŞ'ê ewe ku parastina çand û hebûna gelê Êzidî bike.

Şervanê YBŞ'ê bi navê Rênas Bare diyar kir ku bi salan wan xwe bi hêzên cuda ve dida girêdan heya fermana 74'an çêbû û got: "Pêwîste hêzek were avakirin ku gelê me hewceyî ti kesê neke. Me hêza xwe ya parastina Şengalê daye avakirn ji bo ku em gelê xwe ji komkujiyan biparêzin."



# Li dijî tecrîdê wê têkoşîna me bidome

*Tecrîda şidandî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dike. Nêzî 2 sal in bi ti awayî agahî ji Ocalan nayê girtin. Parêzerê Ocalan Parêzer Mazlûm Dînç diyar kir ku tecrîdeke mîna ya li ser Ocalan li devereke din a cîhanê tune û got, "Hewldanên me yên hiqûqî wê li qada neteweyî û navneteweyî dewam bikin. Têkoşîna me ya li dijî tecrîdê wê bidome."*

Parêzer Mazlûm Dînç ku 7 sal in nikare muwekîlê xwe Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bibîne, diyar kir ku qedexekirina hevdîtinê li dijî hiqûqê ye û got, wê têkoşîna xwe ya li dijî tecrîdê bidomînin.

Tecrîda şidandî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dike. Ji 27'ê Tîrmeha 2011'an û vir ve parêzer û ji 11'ê Îlona 2016'an û vir ve jî malbat nikarin Ocalan bibînin. Nêzî 2 sal in bi ti awayî agahî ji Ocalan nayê girtin. Lewma tirs û fikarên li ser rewşa wî zêde dibin.

Parêzeran heta niha 775 caran ji bo hevdîtinê serlêdan kirin, lê yek jî nehate qebûlkirin. Malbat û parêzer her hefte ji bo hevdîtinê serî li rayedaran didin, lê her carê tê redkirin. Ji parêzerên Buroya Hiqûqê ya Sedsalê Mazlûm Dînç tecrîda li ser Ocalan nirxand.

### 7 SAL IN PARÊZER NIKARIN BIÇIN ÎMRALIYÊ

Parêzer Dînç bi bîr xist ku ji Komploya Navneteweyî ya 15'ê Sibata 1999'an û vir ve li Girava Îmraliyê tecrîdeke giran heye û got, "Tecrîd car carna hîn bêhtir hate şidandin. Ji 27'ê Tîrmeha 2011'an û vir ve hevdîtina parêzeran a bi Ocalan re bi temamî hate qedexekirin. Ev yek li dijî hiqûqê ye."

### MAFÊN OCALAN TÊ ASTENGKIRIN

Parêzer Dînç got, tevî ku Rewşa Awarte hatiye rakirin jî astengiyên li pêşiya hevdîtina parêzeran û tecrîd nehatine rakirin. Dînç destnîşan kir ku ji bo rakirina tecrîdê ew bi salane têdikoşin û wiha dewam kir: "Bi serlêdanên hiqûqî, hem di hiqûqa navxweyî hem jî ya navneteweyî de em têkoşîna xwe didomînin. Heta niha me encameke erênî bi dest nexist. Ji ber ku mesele veguheriye meseleyeke siyasî. Azadî û mafên bingehîn ên Birêz Ocalan weke şantaj û malzemeyeke bazariyê di siyasetê de tên bikaranîn. Mafên nivîsandina nameyan û axaftina bi rêya telefonê yên bi Birêz Ocalan bi salane tên astengkirin."

### CPT HELWESTEKE CIDÎ NÎŞAN NADE

Parêzer Dînç bi bîr xist ku derbarê tecrîdê de wan gelek caran serî li saziyên pêwendîdar ên navneteweyî dane, mehane rapor ji Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) û Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê (CPT) re şandine û hevdîtin bi wan re kirine. Dînç diyar kir ku CPT heta niha bi xurtî neketiye nava liv û tevgerê û got, "Beriya sala 2011'an CPT raporên xwe yên li ser serdanên li Îmraliyê eşkere dikir. Di raporan de qedexekirina hevdîtinên heftane bi tundî dihate rexnekirin û pêşniyar dikir ku divê astengiyên li pêşiya hevdîtinan bê rakirin. Lê belê CPT li ser qedexekirina hevdîtina parêzeran a 7 salan, helwesteke cidî nîşan nade."



Parêzer Dînç da xuyakirin ku tecrîdeke mîna ya li ser Ocalan li devereke din a Ewropa ya jî cîhanê nîne û got, `tevî ku di asteke bilind de mafên mirovan tê binpêkirin, helwesteke cidî nayê nîşandan.

Dînç bi bîr xist ku ji bo hevdîtina bi Ocalan re ew her hefte bi rêk û pêk serî li Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê didin, lê serlêdanên wan tên redkirin. Dînç li ser hinceta redkirina serlêdanan jî got, "Beriya Rewşa Awarte bi sedemên pratîkî pêşî li hevdîtinên me dihate girtin. Timî bersiva 'keştî xerabe ye' ji me re dihate dayin. Piştî ku 20'ê Tîrmeha 2016'an Rewşa Awarte hate ragihandin, biryara destpêkê derbarê Birêz Ocalan de hate girtin.

Parêzer Dînç diyar kir ku serlêdanên wan dewam dikin got, "Tecrîda li Îmraliyê bi Rewşa Awarte re dest pê nekiriye. 7 sal in hevdîtina parêzeran hatiye qedexekirin û tecrîd hatiye şidandin. Em ne bawer in ku ev yek piştî Rewşa Awarte biguhere. Hewldanên me yên hiqûqî wê li qada neteweyî û navneteweyî dewam bikin. Têkoşîna me ya li dijî tecrîdê wê bidome."...*ANF*

## Tecrîda li ser Ocalan tecrîda li ser mirovahiyê ye







Rûspî û oldarên Dêrikê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin û diyar kirin ku tecrîda li ser Ocalan tecrîda li ser hemû mirovahiyê ye.

Nerazîbûnên li hemberî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurda Abdullah Ocalan didome.

Rûspî û oldarên herêma Dêrikê tecrîda li ser Ocalan şermezar kirin û bang li saziyên mafên mirovan yên navnetewî kirin ku bi erka xwe rabin û helwestê nîşanî tecrîdê bidin.

Rêveberê Meclisa Rûspiyan Şêx Senan Ehmed tecrîda li ser Ocalan şeremzar kir û diyar kir ku ev tecrîd li ser hemû mirovahiyê ye û got, "Gelê Kurd bi berxwedan û têkoşîna rêber Ocalan serbilinde." Şêx Ehmed anî ziman ku, ti girêdana dewleta tirk bi islamê re tuneye û wiha got, "rêxistinên mafên mirovan divê erka xwe ya li heramberî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêk bînin û da zanîn ku divê gel bi hemû rêbazan têkoşînê ji bo azadiya Ocalan bike." Şêx Ehmed ji bo ku Ocalan azad bibe banga çalakiyan li her kesî kir.

Serokê Meclisa Rûspiyan Hewas Cidai Egîd jî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û bêdengiya rêxistinên navdewletî û saziyên mafên mirovan şermezar kir û got, "Tecrîda li ser Ocalan sûcekî li dijî tevahî gelan e."

Egîd destnîşan kir ku armanca Tirkiyê ji tecrîdê şikandina îradeya gelan û dûrxistina ji fikirê netewa demokratîk e û wiha got, "Ev yek nîşan dide ku dewleta Tirk ji fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ya aşitî û biratiya gelan ditirse." Hewas Cidai Egîd di dawiya gotina xwe de ji bo Ocalan banga têkoşînê kir.

Ji rêveberên Meclisa Rûspiyan Îbrahîm El-Şibilî bêdengiya rêxistinên navdewletî ya derbarê tecrîda li ser Ocalan de şermezar kir û wiha got, "Ocalan mîmarê aşîtî û mirovahiyê ye, ew ji bo rizgariya hemû gelên bindest têdikoşe."

Şibilî, destnîşan kir ku rêxistinên mafên mirovan ku behsa azadiyê dikin erka xwe bi cih naynin û got, "Bi saya fikirê netewa demokratîk a Rêber Abdullah Ocalan gelên Bakurê Sûriyê bûne yek."

Şibilî bang li gelê Kurd û gelên bindest kir ku li hemberî tecrîdê derkevin...*ANHA*

## Leşkerên Rûs demeke dirêj wê bimînin



Serokê rêjîma Sûriyê Beşar Esad diyar kir, leşkerên Rûs ên ku ji sala 2015'an û vir ve li Sûriyê ne, pêwîstî pê heye ku 'demeke dirêj' lê bimînin.

Beşar Esad ji ajansa Interfaxê re axivî û îdîa kir ku "pêwîstiya bi hebûna leşkerên Rûsyayê ne tenê ji bo têkoşîna li dijî teorrîzmê ye." Esad îdîa kir ku ji ber 'hevsengiyên li herêmê' pêwîstî bi hêzên leşkerî yên Rûsyayê heye û got, "ne diyar e bê hevsengiya ku balê dikişîne ser, kengî pêk were."

Esad bi bîr xist ku peymana bi Rûsyayê re li ser Baregeha Leşkerî ya Hîmeymîmê hatiye îmzekirin ji bo 40 salan e û got, "ev yek jî nîşan dide ku têkiliya navbera her du welatan demdirêj e." Esad da xuyakirin ku vegera penaberên Sûriyeyî yên ji ber şer welat terikandine, yek ji dosyayên girîng e ku ew û Rûsya li ser disekinin.

Li Sûriyê ji sala 2011'an û vir ve şerê navxweyî diqewime û zêdeyî 350 hezar kes mirin, zêdeyî 10 milyon mirov jî li hundir an jî derveyî welat penaber bûn.

## Fener



### Terror sînoran nasnake

Idrîs HENAN

Di 27.Tîrmeha 2013an de bi serpereştiya istixbarata Tirkiyê çeteyên DAIŞ, El Nusra, Ehrar El Şam, Lîwa El Tewhîd û neh togayên mîna "Azadî, Neviyên Selah El Dîn û Yûsiv El Azme yên girêdayî ENKS`ya îro" li Til Eran û Til Hasilê komkujiyek pêk anîn. Di encamê de bi dehan însanan jiyana xwe ji dest dan û bi dehezaran mirov koçber bûn. Beriya du salan li Qamişlo di heman dîrok û mehê de komkujiyek pêk hat. Dîsa armanc sivîlên Kurd û pêkhateyên Qamişlo bûn. Li wir jî destê saloxgeriya Tirkiyê hebû. Îroj li başûrê Sûriyê li bajarê Siwêda bêhna istixbarata Tirkiyê tê. Ango li kuderê terora DAIŞ hebe, sedî sed Tirkiyê heye. Evya dîroka aloziya Sûriyê û çîroka afrîneriya çeteyên DAIŞ û hemtayên wê di Sûriyê, Îraqê û herêmê de isbat dike. Neku em Kurdin vê gotinê dikin. Tam berovajî vê yekê, bi dehan bîner, belge û li xwe mukurhatinên endamên vê terorê diyar dikin ku li paş perdeya her karekî terorane saloxgeriya dewleta Tirk heye. Êdî hevalbendî û hemrewaniya Tirkiyê û çeteyan ne hewceyî lîgerîn û isbatan e. Hejmara mexdûrên êrişên çeteyên DAIŞ li bajarê başûrê Sûriyê Siwêda 250 kesan derbas dike. Li gorî nûçeyên tên parvekirin zêdeyî nîvê wan sivîl in. Ev herêma komkujî lê pêk hatiye, demeke manşêta cîhanê û cihê itîfaqa Amerîka, Rûsya û Îsraîlê ye. Li başûrê Sûriyê landika (şoreşa Sûriyê) Deraa heye. Lê ev dergûş mîna hemû hemtayên xwe Heleb, Humus, Hema û Şamê di encama itîfaqa Amerîka-Rûsyayê û Tirkiyê-Rûsya de hate radestkirin. Gelê Siwêdayê, ango Dirûzên Sûriyeyê ji destpêka aloziya Sûriyeyê ve bi awayekî xweser xwe parastine. Him rejîmê û him jî rikberiyê gelek caran hewl dane bi riya provakasyonan derbasî wê herêmê bibin. Lê gelê Dirzî ku pêkhateyeke olî sedan salane li Rojhilata Navîn dijî, li gorî resentiya çanda xwe, xwe ji van hewldanên herdu aliyan parastiye û herêma xwe li dûrî vê aloziyê girtiye. Lê mixabin destê terora siyasî û berjewendiyên hêzên serdest ji bo ku itîfaq û projeyên xwe yên dijberî îradeya gelan li ser erdê tivî bikin, dirêjtir bû.

Çeteyên ku li bakur-rojhilatê Sûriyê li ser destên QSD derbên giran dixwin, ji nişkêve li başûrê Sûriyê zindî dibin! Di demeke ku mijara mawzubehs Idlib e, li Siwêda komkujî pêk tê! Di dema ku qala çareseriya siyasî tê kirin, dewleta Tirk li Idlib û Efrînê sînorên dagirkeriyê xêz dike û dîktatorê wê di zîrweya Birîks de qala dagirkeriya Afrîqyayê dike. Mutefîqên Tirkiyê yên weke Rûsya li herêmê digerin û behsa gerantiya vegera gelê Sûriyê yê derbider bûye dikin. Çawa dikare ev wêneya kirêt a aloziyê bê fêmkirin? Ma gelo ev çareserî ye yan ji nû ve dîzayînkirina hêzê ye? Çima di vê dema ku herêmên Sûriyê tên radestkirin de li Siwêda kokujî pêk tê? Rasthatina komkujiya Siwêda bi yên Til Hasil, Til Eran û Qamişlo re tesaduf e yan planekî terbiyaya pêkhateyên Sûriyê ye? Li gorî liv û tevgera hêzên mudexeleker û zivirîna goka terorê li ser axa Sûriyê, tê fêmkirin ku piştî heft salan ji aloziyê, ev hêz dixwazin ji nû ve gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe ve kedî bikin û bajon kozê desthilatdariyê. Dixwazin rê li ber zayîna projeya çareseker û îradeya gelan bigirin. Ji ber vê jî berê xwe dan herêma başûrê Sûriyê Siwêda ku bihneke vînê jê tê. Beriya Siwêda Efrîn bînerê terora siyasî ya navdewletî bû.